Wergêrana ji Elmanî:

Bedel Revo



Endiriya Saylir

1. Gihurîn

Çendî tu li vê derê bî
tiştê ji min kêm û fer, serbestî bû
Ha nûke te bar kir û çûyî
eza serbest im.
Lê tinê vê carê
ji min kêm her tu yî…

2. Spasî li ser perawêzê

Ez çi caran li hêviya te nînim.
Lewra, bê metirsî, ez dê li hêviyê
bi dilekê xweş,
bi sîngekê fireh bimînim.
Yan jî, çi caran ne.

Ez li gel te najîm.
Lewra, ez nêzîkê te dijîm bêyî te
bibînim.
Têrwanînek serbest
azad min ya heye hemû deman.

Ez hizra te nakim.
Lewra, hizra xelkî hemûyan
dikim
Hizirên xwe bê rawestan dikim
Dê her dem hizirên li ser xwe
bikim.

Bona te bû min bê rave.
Lewra, xerîbiya te bo min ne
fîxane.
Gîrobûna te bo min ne ya bi
tirse...
Lewra ez jî bê xem jan im.

Tu di cîhana min de nînî

Lewma cîhan bo min bi tinê ye.
Ew cîhan jî, di naxê min de mezin dibe.
Ser hindê re,
di naxê min de
bo yê dî, biçûk dimîne.

Tu ne parçekî ji min
Lewma tu ziyana subahiya minî.
Tu ne nîva min ya berzebûyî
ewa ji min kêm û berze ji wêr ve.

Rêkên me çi cara nabine yek,
Lewra dê li destpêk û dawiyê,
bê şûnwar û bîrhatin
nehêlin kes di rêka mirinê de bi tinê bimîne.

Ez negehiştîme te
Lewra bi tinê li gel xwe mayî me
Ez her ez im,
demê jêk vebûnê
axiftina xwe nakêşim.

Ez hest bi te nakim
Lewra ez hest bi xweşî û jana nakim
Hest bi wî tiştê dibêjnê evîn nakim.
Lewra min tu divêy
Çunkî min divê wesa dibe.

Endiriya Saylir:

- Di sala 1972-ê de, li bajêrê Vaytis devera Şitayamarik ji dayik bûye.
- Felsefe û torê Englîzî û Emerîkî li zankoya Giratis xwandiye.
- Berhemên xwe di rojiname, entolojî û li êzgeha Nemsa de belav kirîne.
- Hejmareka xelatan bi dest xwe ve aniye, ji wan:
Xelatê edebî yê bajêrê Giratis.
Xelatê siyê yê ekadîmiya Giratis li berîkana gotarê.
Xelatê xanimên Nemsa bo hunerî.
- Ev helbeste min ji dîwana wê "Bê xatirxwestin" helbijartîne.